

Destpêk

Di dawiya zivistana 1902yan de bû – ez li Parka Akademiya Leşkerî ya Neustadta Viyanayê di bin dareke kevn a kestaneyê de rûniştibûm û min kitêbek dixwend. Ez ewqas li ser kitêbê kûr bûbûm ku min ferq nekiribû ku profesorê me, Horačekê zana û baş, papazê akademiyê, ku ew tenê ne leşker bû, li cem min rûniştibû. Wî kitêb ji destê min girt, li berga wê mêze kir û serê xwe hejand. Bi meraq pirsî: «Ev şîrên Rainer Maria Rilke ne?» Dû re bi vir û wê de li pelên wê mêze kir, çend hev misra xwendin, ket xewn û xeyalan û serê xwe hejand û got: «Vayê ji şakird René Rilke şairek derketiye.»

Û ez bi wî kurikê zeîfok û xwînmiçiqî hesiyam ku dêûbavên wî berî panzdeh salan ew şandibûn mekteba leşkerî ya li Sankt Pöltenê, da ku ew bibe serleşker. Wê demê Horaček wek xebatkarê ruhanî li wir dixebitî û ev xwendevan gelek baş dihat bîra wî. Wî digot ku ew xortekî pirr jêhatî, sakîn û ciddî bû, ku tevlî karê kesî nedibû, derd û kûlên mecburiyetên jiyana mektebê bi sebir dikişand û piştî sala çaran bi yên din re derbasî lîseya leşkerî bû, ku li Mährisch-Weißkirchenê bû. Li wê derê bunyeya wî bi qasî ku têr dikir, zexm derneket û loma jî dêûbavên wî ew ji dibistana leşkerî girtin û li bajarê xwe, li Pragê, wî dewamî xwendinê kir. Jiyana wî ji wir pê ve çawa derbas bûbû, Horaček nizanibû.

Piştî van gotinan tê fehmê, ku min hema di eynî seetê de qerar da ku ez ceribandîna xwe yê edebî ji Rainer Maria Rilke re bişînim û fikra wî jê rica bikim. Hê ez nebûbûm bîst salî û min li ber şêmûga karekî ku min ziddî xisletên xwe

Einleitung

Im Spätherbst 1902 war es – da saß ich im Park der Militärakademie in Wiener Neustadt unter uralten Kastanien und las in einem Buch. So sehr war ich in die Lektüre vertieft, daß ich kaum bemerkte, wie der einzige Nicht-Offizier unter unseren Professoren, der gelehrte und gütige Akademiefarrer Horaček sich zu mir gesellte. Er nahm mir den Band aus der Hand, betrachtete den Umschlag und schüttelte den Kopf. «Gedichte von Rainer Maria Rilke?» fragte er nachdenklich. Hier und dort blätterte er dann auf, überflog ein paar Verse, schaute sinnend ins Weite und nickte schließlich. «So ist aus dem Zögling René Rilke also ein Dichter geworden.»

Und ich erfuhr von dem schmalen, blassen Knaben, den seine Eltern vor langer als fünfzehn Jahren in die Militär-Unterrealschule in Sankt Pölten gegeben hatten, damit er später Offizier werde. Damals hatte Horaček als Anstaltsgeistlicher dort gewirkt, und er entsann sich des ehemaligen Zöglings noch genau. Er schilderte ihn als einen stillen, ernsten, hochbefähigten Jungen, der sich gerne abseits hielt, den Zwang des Internatslebens geduldig ertrug und nach dem vierten Jahr mit den anderen in die Militär-Oberrealschule vorrückte, die sich in Mährisch-Weißkirchen befand. Dort freilich erwies sich seine Konstitution als nicht widerstandsfähig genug, weshalb ihn seine Eltern aus der Anstalt nahmen und daheim in Prag weiterstudieren ließen. Wie sich sein äußerer Lebensweg dann weiter gestaltet hatte, wußte Horaček nicht mehr zu berichten.

Nach all dem ist es wohl begreiflich, daß ich noch in derselben Stunde beschloß, meine dichterischen Versuche an Rainer

didît, hêvî dikir ku ancax kesekî wek şairê kitêba *Mir zur Feier* min fehm bike. Û ya rast bêyî ku ez bixwazim, bi mis-rayên min re nameyek jî derket holê, ku min tê de dilê xwe ne hetanî wê demê û ne jî piştî wê ji mirovekî din re ewqas zêde vekiribû.

Hetanî cewab hatibû, gelek hefte derbas bûbûn. Nameya ku bi rengê hêşîn hatibû mohr kirin ji Parisê bû, di destê min de giran dixwiya û li ser zerfê xetên bi rêk û pêk, vekirî û rind hebûn, ku name ji serî heta binî her bi van xetan hatibû nivîsîn. Bi vê nameyê ve min û Rainer Maria Rilke, me dest-pê kir, ku em ji hev re nameyan bişînin, ku hetanî 1908an kudand û dû re pê de-pê de bi dawî hat, ji ber ku jiyanê ez ber bi hin hêlan birim, ku şair bi dilgermî, nazikî û meraq xwestibû min ji wan biparêze.

Lê ev mûhîm nine. Tişta mûhîm tenê ev deh name ne, ku li dû hev tên. Ew bi taybetî ji bo fehmkirina şert û mercên jiyan û afirandina Rainer Maria Rilke mûhîm in. Û ji bo mirovên ku îro û sibê dikemilin û mezin dibin jî mûhîm in. Û gava li çiyekî yekî mezin û tekane qise dike, divê yên piçûk bêdeng bin.

Berlin, Hezîrana 1929an

Franz Xaver Kappus

Maria Rilke zu senden und ihn um sein Urteil zu bitten. Noch nicht zwanzigjährig und knapp an der Schwelle eines Berufes, den ich meinen Neigungen gerade entgegengesetzt empfand, hoffte ich, wenn überhaupt bei jemandem, so bei dem Dichter des Buches «Mir zur Feier» Verständnis zu finden. Und ohne daß ich es eigentlich gewollt hatte, entstand zu meinen Versen ein Begleitbrief, in dem ich mich so rückhaltlos offenbarte wie nie zuvor und niemals nachher einem zweiten Menschen.

Viele Wochen vergingen, bis Antwort kam. Das blaugesiegelte Schreiben zeigte den Poststempel von Paris, wog schwer in der Hand und wies auf dem Umschlag dieselben klaren, schönen und sicheren Züge, in denen der Text von der ersten Zeile bis zur letzten hingesetzt war. Damit hob mein regelmäßiger Briefwechsel mit Rainer Maria Rilke an, der bis 1908 währte und dann allmählich versickerte, weil mich das Leben auf Gebiete abtrieb, vor denen des Dichters warme, zarte und rührende Sorge mich eben hatte bewahren wollen.

Doch das ist nicht wichtig. Allein wichtig sind die zehn Briefe, die hier folgen, wichtig für die Erkenntnis der Welt, in der Rainer Maria Rilke gelebt und geschaffen hat, und wichtig auch für viele Wachsende und Werdende von heute und morgen. Und wo ein Großer und Einmaliger spricht, haben die Kleinen zu schweigen.

Berlin, im Juni 1929

Franz Xaver Kappus